

Nameyek ji NEWROZê re

Li Başûrê Cîhanê Dengê Tê

Riza Çolpanê Dêrsimî

Li Awistûralya, ji xwendevanên Newroz û hemû Kurdperwerên Başûrê biçûk re, silav û rêz23-5-2011

Roj baş birayên xoşewîst, ez çil û yek sal e ku li başûrê cîhanê, li ser erdê kîşwera Awistûralya, li bajarê Sydney dijîm. Îro mirovekî temen heftê û pênc (75) salî, kalekî rîsipî me. Ango, min piranîya jîyana xwe li ser erdê vê kîşwera kevin derbas kir, lê li pêş çend salê min ên jîyanê mane, ez wê nizanîm, tenê Xwedê dizane.

Xwendevanên delal, ez di sala 2001'î da hatim ser erdê we yê pîroz, ku em ji wê erdê ra "Kurdîstana Başûrê Biçûk" dibêjin, bûm mêvanê çend Kurdperwerên Kurdistan, kesên hêja. Li Helebê bûm mêvanê Terzî Kek Osman, ku ew bi xwe Kurdekî Kobaniyê ye. Li Şamê bûm mêvanê hozan Dilawerê Zengî, û li Qamişlokê jî bûm mêvanê berêz Bavê Dara, Kek Newaf. Li wir bûm nasê serokê hêja û gorbihîşt, -ku çendek berê çûye heqîya xwe- Kek Îsmailê Dilovan. Van camêran ji min ra gelek karguzarî kirin, bi destûra we ez dixwazim berî her tişt ji van birayên xwe ra "spas", ji bo Kek Îsmail jî "di nav nûr da raze, ciyê wî, ku heye bihişt be" bibêjim, dûra jî bi kurtî qal û behsa bîografîya xwe bikim, ku hûn vî birayê xwe bêtir nas bikin.

Belê, navê min Riza Çolpan e, lê li welêt, anga li Dersim, bi taybetî jî li herêma qeza Mêzgirê, li wa Moxindiyê û li herêma qeza Depê -ku îro ew der girêdayî Xarpitê ye- bernavka malbata me "**Mala Guran**" e. Gelşa vê bernavkê jî bi jan û êş e. Min di bîranînên xwe de ,dûr û dirêj qal û behsa

vê gelşê û vî navî kirîye. Bîranînên min bi du (2) zimanan çap bûne; Ango ,bi Kurdî û Tirkî. Çapa Kurdî li Stenbolê, di nav weşanên "VENG"ê, "Jan û Jîyan, Bîranîn û Serhatiyên min". Çapa bi zimanê Tirkî jî di nav weşanên "DOZÊ" da derket, bi navê "Coğrafyasını Arayan Irmak, Acı ve Yaşam". Wate bi zimanê Kurdî "Çem Li Erdnîgarîya Xwe Digere, Jan û Jîyan".

Ez di payîza sala 1936'an de, li gundê nav "KÛPIK" ji dayîk bûme, hatime cîhanê. Min di sala 1946'an de ,destpêkê xwendina Tirkî kir. Ango, di deh saliya xwe de, lê bi zora dewleta xwînxwar. Du cendirme, li tev serbexo, anga muxtarê gund hatin, ji bavê min re gotin :“ Divê tu vî lawê xwe bişînî dibistanê; Lê eger ku tu naxwazî, divê 150 panginot dirav ceza bidî “,ku 150 panginotên wê dem û wextê, bê derew qasî 150 hezar lîra yê Tirk ê vê demê bû, ku bavê min ê kesîb ewqas dirav di xewna xwe da nedidît. Kesîbê Xwedê bêgav û bê havil ma ez şandim dibistana dijmin. Min pênc sal xwend, lê nebûm xudan buruntî, anga dîplomê. Lê, min perwerda xwe ya xwendinê di dibistanan, zanîngeh, enstitu û akademîyan da nedidît. Di destpêkê de , ez bi xwe bûm mamosteyê xwe. Ji ber ku ez bengiyê xwendinê bûm û evîna dilê min xwendin bû. Ji ber vê yekê jî ez ji xwendinê dûrneketim. Çi pirtûk, çi rojname, çi kovar min dît, birçî mam, lê min kirî û xwend. Piştî zewacê bergehên min bêtir fereh bûn, ez di rûplê pirtûkan de bûm ,nasê jîyana civakî, erdnîgarîya cîhan, çar (4) pirtûkên asîmanî, bi gotinek dî semawî, ol û rêolan, bûm nasê dîrok, çand, awaz û zargotina gelê xwe; bûm nasê sazûmanên kevin, wek sazûmana Kevneyar, **D.R (7)**